Kaxiz helwesta

# Kar beşdarbûn e: Penaberên kêmendam hewcedariya baştirkirina gihîştina bazara kar a bingehîn in



## NOW! Ne bêyî Me

### Di derbarê me de

„NOW! Ne bêyî Me“ piştgirêdana bi xwe ya penaberên kêmendam e. Em bi xwe penaber in û kêmendamiya me heye. Ji dema hatina me ya Almanyayê ve em rastî astengiyan tên. Lê em di koma xwe de têgihiştin û hevgirtinê dibînin. Em hevûdu xurt dikin û bi hev re ji bo civakek berfireh dixebitin.

Em tiştekî dikin ku penaberên kêmendam û malbatên wan li Almanyayê bikaribin baştir bijîn.

**Penaberên kêmendam bi zehmet dikevin nav bazara kar a bingehîn de. Ev jî pêvajoya gihîştin û beşdarbûnê pir zehmet dike. Di standina destûra niştecihbûnê ya daîmî û hemwelatîbûnê de jî ku amûra debarê ya serkeftî jêre şert e, kêmasiyên mezin hene.**

## Sedeman:

Gelek sedem hene ji bo gihîştina dijwar a bazara kar a bigehîn. Wek mînak, gelek cihên kar ne bê asteng in. Her wiha ji bo kesên ku kêmasiyên wan ên îdraqî hene, têra xwe kursên entegrasyonê tunene û ji bo kesên kor jî kursên ziman pir hindik in. Di reklamên kar de kêm caran behsa kesên kêmendam tê kirin. Di dema pêşkêşkirina serlêdanên kar de, serlêderan bi gelemperî li gorî kêmendamiya xwe têne sinordarkirin. Gelek kardêr texmîn dikin ku ew pir caran nexweş in, hewceyê gelek alîkariyê ne û nikarin ewqas bixebitin. Penaberên kêmendam gelek caran ji ber eslê xwe bi pêşbiryarê re rû bi rû dimînin. Kardêr dikarin serlêdana alîkariyê bikin, lê ew pir tevlihev e. Navendên kar gelek caran têra xwe piştgirî nadin penaberên kêmendam di lêgerîna kar de li bazara kar a bingehîn.

## Encam:

Li şûna wê, gelek penaberên kêmendam di atolyeyên ji bo kesên kêmendam de dixebitin. Di atolyeyan de rêjeya herî kêm a mûçeyê nîne. Dema di atolyeyan de derbas dibe jî wekî amûra debarê nayê hesibandin ji bo destûra rûniştinê ya daîmî an jî hemwelatîbûnê. Karekî ewle bandorek erênî li ser destûra rûniştinê dike.

Ji ber vê yekê, penaberên kêmendam nakevin nav civaka Almanî de. Ew li rastî bê parkirin û dûrketinê tên. dema dor tê wergirtina destûra rûniştinê ya daîmî, ew bê par dimînin.

## Daxwazan:

1. **Atolyeyan:**
   - Divê demjimêrên xebatê yên di atolyeyan de ji bo ewlekirina rûniştinê were nas kirin. Wekî din li atolyeyan rêjeya herî kêm a mûçeyê lazim e. Di heman demê de, divê atolyeyan werin veguhertin ji bo atolyeyên şiyanê û divê qabiliyetên kesane werin pêşvexistin.
   - Divê erka veguhastinê ji bo bazara kar a bi qanûn were tertîbkirin. Ji bo xurtkirina tevlêbûna di bazara kar a bingehîn, divê dayîna tezmînatê (§ 160 ji Pirtûka nehemîn ya Qanûna Civakî-SGB IX) were zêdekirin. Divê di vir de ti qul tenebin Ji bo kêmkirina diravên tezmînatê.
   - Divê ji bo kesên kêmendam zêdetir kursên entegrasyon û zimanê hebin.
2. **Pêvajoya serîlêdanê:**
   - Divê pêvajoyên serîlêdanê zelal bin. Di pêvajoyên serîlêdanê de cihêkarî tune, ji bo mînak, pêvajoyan li gorî qanûnê hatine tertîbkirin û bê nav tên meşandin. Divê hikûmeta federal vê yekê diyar bike.

3. **Cihê kar:**
   - Divê gihandina bê asteng mecbûrî be. Wekî beşek ji rêziknameya cihê kar, divê qaydeyên zelal ên ji bo sêwirandina cihên kar ên bê asteng werin diyarkirin.
   - Danûstandina birêkûpêk di navbera navenda kar û kardêr de li ser çawaniya zêdekirina tevlêbûna li cihê kar (polîtîkaya pêşkeftina tevlêbûnê - Inklusions-developmentpolicy). Pêdivî ye ku karanîna fonên tezmînatê ji bo sêwirandina cihê xebatê ya bê astengî, bi hêsanî were pêşkêşkirin.
   - Heke cihê kar ne bê asteng be, divê cihên kar ên alternatîf werin pêşkêşkirin, ji bo mînak, vebijêrka ofîsa malê an alternatîfên din.
   - Divê di şîrketan de ji bo kesên bi giranî kêmendam nûneratiyek hebe.
4. **Şiyarkirina beşdaran û mexdûran ji hêla pisporan ve:**
   - Şiyarkirina kardêran di derbarê fikarên mûmkîn de dema ku ew penaberên kêmendam didin xebitandin.
   - Şiyarkirina saziyên siyasî di derbarê tevlêbûna penaberên kêmendam di bazara kar a bingehîn de.
   - Şiyarkirina penaberên kêmendam û endamên malbatên wan di derbarê maf û vebijarkên wan de.
   - Û şyarkrin di atolyeyan de di derbarê tevlêbûna bazara kar de.